لەم ژمارەیەدا :
- چالاكی كوردەكانی بریتانیا .
- نەورۆزی خوێناوی .
- هەڵەبجە لە چاپەمەنی جیهانیدا .
- ئالمانیای رۆژئاوا و بەكارهێنانی ...
- ٩٠ ساڵەی رۆژنامەگەری كوردی .
- یادی " دیمەن "
- برتولت بریشت و فیـر بوون .
- دەنگدانەوەی جینایەتی بەعس .

# سەردەمی نوێ

رۆژنامەیەكی سیاسی - فەرهەنگی كۆمەلایەتیە

ساڵی سێیەم | ژمارە ٢٧ | خاكەلێوە - ئەپریلی ١٩٨٨ | نرخی ١٠ كرونە



## لە كارەسات مەزن تر ....

نووسینی : "كریمی حیسامی"

ئەوەی لە ئەنجامی شەری نێوان دوو حكومەتی كۆنەپەرست و تۆتالیتێتی ئیران و عیراق دا بەسەر گەلی كورد هاتوە، گەلێك لە كارەسات گەورەترو داخدارترە . ئەوەی حكومەتی فاشیستی بەعس بەسەر شاری **حەلەبجەی** هێناوە هیرۆشیمایەكە پاش ٤٣ ساڵ لە مێژوی مرۆڤایەتیدا دووپات دەبێتەوە . دیارە لەماوەی ئەو چەند ساڵەی دواییدا ئەوەی حكومەتی بەعسی عیراق لە كوردستان كردوو - یەتی رووی گشت رەگەزپەرەست و فاشیستێكی سپی كردۆتەوە . بەلام باسەكەی ئێمە لەسەر كارەساتی **حەلەبجە** یەو هەرچی لەسەریشی بنووسری كەمە .

لە ساڵی ١٩٢٥ كە لە كون وانسیۆنی ژنێف بەكارهێنانی چەكی كیمیاوی قەدەغە كراوەو پاش شەری دووهەمی جیهانیش تا ئەمرۆ گۆیا مرۆڤایەتی پل و پایەتی كە پێشگری لە بەكارهێنانی چەكی قر كردنی بە كۆمەل بكا و نەهێلی جارێكی تر كارەساتی هیرۆشیما دووپات بێتەوە . بەلام رووداوەكان دەری دەخەن كەبن و بەینی نێو دەولەتان ، وتەو ئاخافتنی پشتی میكرۆفۆن ، نووسینی سەر كاغەزو بێ هەلشاخانی دیفاع لە مافی مرۆڤ و ئازادی و دیموكراسی هەمووی بەیت و باوەو تەقەللایەكە بۆ پێنە كردنی تاوان و جنایەتی ملهورو زۆرداران . دەنا ئەگەر وا نەبێ چۆن حكومەتێكی خوێن خۆر شارێكی ٧٠ هەزار كەسی لە ولاتەكەی خۆیدا پەلامار دەداو بە بۆمبای كیمیاوی و بە گازی ژاراوی سیانورو خەردەل لە ماوەی چەند دەقیقەدا پێنج هەزار كەسی بێ تاوان و بێ دیفاع قر دەكاو دەیان هەزار كەسیش بریندارو ئاوارەو سەرگەردان دەكا .

بۆ لاپەرەی ٢

## هێزە سیاسیەكانی كوردستان، جینایەتی حكومەتی بەعسی عیراق لە قاو دەدەن

كاك **مەسعود بارزانی** سەرۆكی حیزبی دیموكراتی كوردستانی عیراق لە راگەیاندنێكی رۆژنامەگەریدا پەردەی لەسەر جینایەتی رژێمی بەعس لاداوەو دەلی : " شازدەی ئازاری ١٩٨٨ فرۆكەكانی رژێمی فاشیستی عیراق بە شێوەیەكی وەحشیانە شاری **حەلەبجەو** دەورو بەریان بە بۆمبای كیمیاوی و ژاراوی بۆمباران كرد . ئەم كردەوە وەحشیانە بوو بە هۆی شەهید- بوونی هەزاران هاونیشتمانی بێ تاوان كە زۆربەیان ژن و مندالی پیرە پیاو بوون . شاری **حەلەبجە** كراوەتە قەبرستانێكی گشتی كە نیزیكەی چوارهەزار كەس كوژراو هەوت هەزار كەس بریندار بوون ئێمە داوا لە هەموو رێكخراوەكانی جیهانی و مرۆڤایەتی كۆرو كۆمەلانی سیاسی و كۆمەلایەتی و كەسانی بەشەرەف دەكەین ئەو كردەوەی رژێمی عیراق مەحكوم بكەن و بۆ پێشگرتنی كردەوە- یەكی ئاوا ئاوانبارانە هەنگاو بنێن ."

**كۆمیتەی دەرەوەی یەكیتی نیشتمانی كوردستان لە بەیاننامەیەكدا جینایەتی** رژێمی بەعسی عیراق روون دەكاتەوەو دەنووسی : " تەنیا رۆژانی شازدە و هەڤدەی ٣ ی ١٩٨٨ ناو شاری **حەلەبجەو** دەورو پشتی و دۆلی جافەتی ٩٦ جاربە فرۆكەو بومبای كیمیاوی بۆردومان كراوە . لە ئەنجامدا زیاتر لە چوار هەزار ژن و مندال و پیر شەهید بوون و هەزاران بریندارن ."
لە بەیاننامەكەدا گوتراوە داوا لە هەموو رێكخراوە كوردستانیەكانی هەموو پارچەكان و هەموو كوردە ئاوارەكان و دلسۆزانی گەلەكەمان ئەكەین كە بە دەنگ لێ قەوماوی و ئەرگەكانی ئەم رۆژە سەختەی گەلەكەمانەوە بێن و ....

بۆ لاپەرەی ٦

## هەڵەبجە- شاری قوربانی گازی كیمیاوی

" **پاتریك تایلەر** " هەواڵدەری رۆژنامەی **واشنگتۆن پۆست** كە سەری لە شاری **حەلەبجەی** ویرانكراو داوە، راپۆرتەكەی خۆی ئاوا دەست پێدەكا :
" فرۆكەیەك لە لای رۆژئاواوە- دەركەوت و بۆمبایەكی فڕێدا . لەگەل تەقینەوەی بۆمباكە، هەورێكی زەرد و سپی پەیدابوو . شاری كورد نشینی **حەلەبجەی** داگرت، بووبە هۆی مردنی سەدان و هەزاران كەسی دانیشتوی لەم شارەدا . پتر لە ١٠٠ تەرمی ژن و پیاو ومنال و گەورە هێشتا لە كۆلان و شەقامەكانی ئەو شارە چۆلەدا دەبینرێ هێندێ لە قوربانیەكان بە بێدەنگی مندالەكانیان لە ئامێز گرتوە، هێند یكیش لە بەر دەرگا بوونە گلۆڵە . خاو خێزانی مالێك لە پەنا سفرەكەیاندا كەوتوون .

بۆ لاپەرەی ٢

هەواڵنامەی كتێب

عیراق و بە بەکار هێنانی ئەم چەکە ترسناکە قەدەغە کراوە لە لایەن مرۆڤایەتیی نێو نەتەوایەتییەوە خۆی دەکاتە یەکەم رژێم لە مێژوودا کە بە تەیارەو تۆپ ئەم چەکە کوشندەیە ئەبارێنێتە سەر "هاو وڵاتیەکانی" خۆیدا.

گەلی کوردمان کە لە مێژووە دۆستایەتی و برایەتی ئەیبەستێتە گەلی عەرەبەوە ئەم دۆستایەتی و برایەتیەی کە لە کارەکانی پاڵەوانی کورد سەلاحەددینی ئەیوبی رەنگیان داوەتەوە، داواتان لێ دەکات دەس بەجێ دەنگ بەرز کەنەوە تاوەکوو ئەم تاوانە دووبارە نەبنەوە ".

هەروەها نامەکە داوا ئەکات لیژنەی کۆکردنەوەی فاکت بنێردرێتە کوردستانی عیراق" تا وەکوو نەتەوەی عەرەب شایەت بێ و بە چاوی خۆی ئەو تاوانە ببینێ کە رژێمی رەگەز پەرست بە ناوی عەرەبەوە بە ئیمەوە دەیانکات " لە کۆتاییدا نامەکە داوا دەکات " یارمەتی پزیشکی و مرۆڤایەتی تر بە ناوی نەتەوەی عەرەبەوە بنێرن تاوەکوو ببنە درۆشمی پتەوی دۆستایەتی و برایەتی مێژوویی نێوان هەردوو نەتەوەی کورد و عەرەب .. "

پاش نیوە رۆی رۆژی ۲۹ / ۳ ریکخراوە کوردستانیەکان و کەسانی بێ لایەن خۆپیشاندانیکی گەورەیان لە پێش دەفتەری سەرەک وەزیرانی بەریتانی رێک خست و نامەیەکیان دا بە سەرەک وەزیران مارگریت تاچەر. لە نامەکەدا دەوترێت:

" ئێمەی خەڵکی کوردستان کە لە بریتانیا نیشتە جێین، تکاتان لێ دەکەین وەک سەرۆکێکی جیهان دەنگتان بەرز بکەنەوە و بە ئاشکرا نەفرەت بکەن لە قەڵاچۆکردنی گەلی کوردی بێ تاوان و بە کارهێنانی چەکی کیمیاوی لە لایەن حکومەتی عیراقەوە دژی دانیشتوانی بێ تاوانی هەڵەبجە " تکامان وایە " داوا بکەن لە نەتەوە یەکگرتوەکان لیژنەیەکی کۆکردنەوەی فاکتی بێ لایەن بنێرێتە کوردستان بۆ وەدەستهێنانی راستی وگەورەیی ئەو تراژیدیەی کە لە هیرۆ شیما بەو لاوە وێنەی نیە "

خۆ پیشاندەرەکان لە وێوە رۆیشتنە پێش بارەگای نەتەوە یەکگرتوەکان و نامەیەکی تریان بەم هۆیەوە روانەی هافیز پیرس دیکولار - سکرتێری گشتی ریکخراوی نەتەوە یەکگرتوەکان کرد. نامەکە دەڵێت:

" ئێمە باش دەزانین دەم بەستراون و ریکەوتنامەکان ریگاتان نادەن دەست بخەنە "کارو باری ناوخۆیی" دەوڵەتیکی ئەندامەوە بەلام کوشتنی زیاتر لە ۱۰ هەزار ژن ومنداڵ بە چەکی کیمیاوی قەدەغە کراو بیستر لە تاوانی نازین - دەبی ویژدانتان بجولێنێ تا بە ئاشکراوی رێز ترف سەددام حوسێن تاوانبار بکەن، ئەم سەرەک کۆمارە نامروڤەی عیراق کە رێز نەگرتنی تەواوی خۆی سەبارەت بە مرۆڤایەتی بە پیسترین شێوە دەرخست. .. ئێمە بڕوامان وایە کە وەلامان دەدەنەوە هەتا وەکوو ئەگەر بێتە تەگەرەش لە بەردەم پێشکەوتنتانا بۆ کاریکی باشتر لە پاشەرۆژدا. ئێمە چاوەروانی وەلامین ".

لە کاتژمێری دووی پاش نیوەڕۆی هەمان رۆژ کۆمەڵەی خویندکارانی کورد لە ئوروپا (بارەگای پراک) خۆپیشاندانیکی گەورەی لە پێش مەڵبەندی روشنبیری عیراق ریکخست لە ژێر درۆشمی " دەست هەڵگرن لە کوردستان ئەی خوین ریژەکان " هەندێ لە بەشداربووەکان ماسکی دژی چەکی کیمیاویان لە بەر کردبوو بۆ راکێشانی سەرنجی هاتووچۆکەران و رۆژنامە نووسەکان. بە دەنگی بەرز هاواریان دەکرد " دژ بە هەردوو رژێمی بەعسی فاشی و خومەینی بۆگەن "

رۆژی پاشتر کۆمەڵی کورد هەڵیان کوتایە سەر هێڵی ئاسمانی "ئێیر فرانس" فەرەنسا و داگیریان کرد و لە وێوە نامەکیان ئاراستەی سەرکۆمار و سەرەک وەزیرانی فەرانسە میتران و شیراک کرد دوای گفت و گۆیەکی چوار سەعاتی لە گەڵ کاربەدەستانی فەرەنسە لە لەندەن لە سەر ئەوە ریک کەوتن کە رۆژی دووشەممە ۳/۲۸ نوێنەری خۆ پیشاندەرەکان چاویان بە سەفیری فەرەنسە بکەوێ لە لەندەن. لەو چاو پێکەوتنەدا سەفیری فەرەنسە نیزیکەی بیست دەقیقە قسەی کرد و کورتەکەی ئەوەیە کە گوایە فەرەنسە قەت دوژمنایەتی گەلی کوردی نەکردوە و چەکی تایبەتی دژ بە بزووتنەوەی پارتیزانی کوردی نەداوەتە عیراق و کومپانیا و شەریکەکانی فەرەنسە زیاتر لە وانی ئورووپی تریان نەکردوە سەبارەت بە فرۆشتنی شتوومەکی کە چەکی کیمیاوی پێ دروست دەکرێت و هەروەها ئێستاش فەرەنسە پەیرەوی سیاسەتی ژەنرال دیگول دەکا کە بریتیە لە پاراستنی ئەو رێژیمانەی لە رۆژ هەلاتی نێوە راست دا هەن. نوێنەری ریکخراوە کوردیەکانیش بۆ سەفیریان روون کردۆتەوە کە فەرەنسە چەکی زۆر کاریگەر دەداتە عیراق، ئەمیش بە تایبەتی دژی پێشمەرگەی کورد بەکاری ئەهێنێ وەک هێلی کۆپتەری " ئطلویت " و (فریلون) و سوپەر فریلون) و هەروەها چەندەها تەیارەی تری فەرەنسی بەشدار بووە لە دروست کردن وکار کردنی کارگاکانی چەکی کیمیاوی لە سامەرا و عەکاشات و بە شیوەیەکی بەردەوام ۲۰۰ فرۆکەوانی سەربازی عیراقی لە شاری "دیترون"ی فەرەنسی لە مەشقدان. ئەم فاکتانە وای لە سەفیر کردوە خۆ گێل کات و باسەکە بگۆرێ و بە تووڕەییەوە بپرسێ:

" ئەی ئێوە ی کورد بۆ دژی "روسیا" ناوەستن کە بە گشت جۆرە چەکێ یارمەتی عیراق دەدات؟ "

لە لایەکی ترەوە ئەو نامەیەی کە ئاراستەی هەردوو سەرۆکەکانی فەرەنسە کراوە، دوای باسکردنی کارەساتەکەی هەڵەبجە دەڵێت داواتان لێ ئەکری دەس بەجێ یارمەتیتان لە رژێمی عیراق ببرن تاوەکوو ئەو تاوانبارە شەرانیە هان نەدری بەرەو بەردەوام بوونی شەری دژی گەلی کوردمان. تکامان وایە پرستیژی خۆتان لەگەڵ سەرۆکەکانی جیهانی تر بەکار بهێنن و کارێکی وابکەن سەددام حوسێن دەس بەجێ تاوانە بێ وێنەکانی بوەستێنێ دژ گەلەکەمان لە کوردستانی عیراق. ئێمە پێویستمان بە یارمەتیتان هەیە ئێستا بەدەنگی تاوانە لەو باوەرە داین کە شتێک بکەن ئێستا "

لە هەمان رۆژدا هێزە موسڵمانەکانی دژ بە رژێمی بەعسی خۆ پیشاندانیکی مەزنیان لە پێش بالیوزخانەی عیراق ریک خست و تاوانباری سەددام ودەمرگا فاشیستەکانیان کرد بە کشتن و بە کار هێنانی چەکی کیمیاوی دژی گەلی کورد بە تایبەتی.

پێجگە لەوانە ئاهەنگی نەورۆزی ئەم ساڵی کوردەکان لە لەندەن بە شیوەیەکی نائاسایی ئەوتۆ کەلەگەڵ کارەساتی هەڵەبجە بگونجێ سازکرا. دوکتور تالیب کاکەیی سەروکی مەڵبەند لە وتاری خۆیدا باسی رووداوەکانی کوردستانی کرد و گوتی "

بۆ لاپەرەی ۷



هەواڵنامەی کتێب



## یادی هێمن

١٧ ئەپریل دوو ساڵ لە کۆچی دوایی شاعیری مەزنی کورد "هێمن" رادەبری . برای بەڕێز کاک خدر باپیر بەستە شیعرێکی بڵاونەکراوەی ماموستای بەڕێزی بۆ ناردووین کە وا بە یادی ئەو شاعیرە مەزنە خۆشەویستە بڵاوی دەکەینەوە . ئەم شیعرە لە کاتێکدا گوتراوە کە شاعیری مەزنی کورد لە شیلاناوی ژێر سێبەری "دیموکراسی و پلورالیسم" ڕێبەرایەتی حیزبی دیموکرات دا خانە نشین کراوە و ڕێگا نەدراوە تەنانەت خەڵکیش ئاموو شۆی بکات .

## ★★★ خانەنشین .. ★★★

بولبولێک بووم لە قەفەس دا بە بەهاری ڕەنگین
دوور لە گوڵزارو لە دیداری گوڵاڵەو نەسرین
کازیوە بۆ لك و بۆنی گوڵی باغی دەفڕیم
پەرو بۆم پێوە نەما ، نیمە ئیتر هێزی فڕین
دەستی ئەو ڕاوکەرە بەرزێ کە بڕی بازو بڕست
سووری سوور گوڵ بەدەم و ڕوو بکەمە مێرگی شیرین
من چریکەم هەموو سووچی چەمەنی پڕ کردبوو
ئێستە نایە لە گەرووم بێجگە لە ناڵەی خەمگین
من کە شین گێڕی هەموو سوورە گوڵێ پەر پەر بووم
ڕەنگە هەر دڕکی پەڕێو لێرە بکا بۆ من شین
من کە بۆ دیتنی گوڵ هێلی سوورم دەبەراند
هەر لە سەر حەق گوتنی ڕووتە کرام خانە نشین
شاوە ڕێخنە دەگەڕێ وا لە دەواری چۆمەدل
دینی دیتنی گوڵە شەو ، بولبولی دل پڕ لە ئەوین
تازە دڵ خەستەو پەر بەستەو بێ دەستم من
وەرە دەر ڕاوکەری دڵ ڕەق لە کەلێن و لە کەمین
تیبەری هێندە بە ناخۆشی ئەگەر ژینی دڕێژ
خۆزگە سەد خۆزگە بەوانەی کەم و ئاسوودە دەژین

* * *

"تی بینی"

گێڕانەوەی نووسراوەو بۆچوونی چاپەمەنی جۆربەجۆری جیهان لە بارەی کوردستان و ڕووداوەکانی نێو جوولانەوەی ڕزگاریخوازی کورد بەو مانایە نیە کە نێوەرۆکی باسکراوەکان بە تەواوی لەگەڵ بۆچوون و بیرو باوەڕی دەستەی نووسەران یەك دەگرنەوە . مەبەستی ئێمە ئەوەیە کە ئێوەی بەڕێز لە بۆچوون و بیرو ڕای ڕێکخراوەو حیزب و کەسانی جۆربەجۆر لە بارەی کوردستان و بزوتنەوەی ڕزگاریخوازی کورد ئاگاداری یان هەبێ .

"سەردەمی نوێ"

# برتولت برێشت و فێربوون

برتولت برێشت هونەرمەندی ناودارو نومایشنامە نووسی هەڵکەوتووی ئەڵمانی ١٠ی مانگی فێوریەی ١٨٩٨ لە خێزانێکی دەوڵەمەند و تێر وپڕ لە دایك بوو . پاش تەواو کردنی دەبیرستان لە شاری مونیخ دەستی کرد بە خوێندنی زانستی سروشت و پزشکی . لە شەڕی یەکەمی جیهانیدا چوە خزمەتی ئەرتەش و ناردیان بۆ بەرەی شەڕ . هێشتا هەر لە زانستگابوو ، هەوەڵین شیعر و پەخشانی خۆی بڵاو کردەوە . برێشت لە پارچە شیعرێکدا بە ناوی "دەر کراوی بە هەق" دەنووسێ "من وەك کوڕە دەوڵەمەندێك گەورە بووم . دایك و بابم یەخەیەکی ئاهاریان کردە ملم . منیان بە دابی مەزنەتی و خاوەن خزمەتکار پەروەر دەکرد . هونەری ئەوەیان فێرکردم کە بە فەرمان بدەم بەلام کاتێ تۆزێ گەورە بووم لە دەوروبەری خۆم ڕوانی ، خەڵکی هاو چینی خۆم خۆش نەویست نە لە فەرمان دان و نە لە خولامی . لە هیچ کامیان ڕازی نەبووم . هەر بۆیەش وازم لە چینی خۆم هێنا و کەوتمە خزمەتی خەڵکی هەژارو نە دارەوە . بەم جورە ئەوان خائینێکیان پەروەردە کرد . ئەوان هەموو هونەری خۆیان فێری ئەو کرد ، ئەویش ئەوانی بە دوژمنان فرۆشت ".

لە ساڵەکانی سەرهەڵدانی فاشیزمدا ، برێشت داوای لە هونەرمەندان کردکە بە نیشاندانی زۆرکاری ڕاستەقینەی سەرمایە دارانی چەوسێنەرو فاشیزم ، وە وریاکردنەوەی کۆمەلانی خەڵك ، ئەرکی مێژوویی خۆیان بە جێ بگەیەنن .

برێشت دەیگوت : " لە کاتێکدا ئەو گشت جنایەتە دەکرێ ، ئەو خەڵکە بە کۆمە ل دەکوژرێ ، شەڕو خوێن ڕێژی درێژە هەیە باسی جوانی دارو درخت و نەغمەی باران تاوان نیە ؟ داخوا کاتی ئەوە نەهاتوە لە بەرامبەر زوڵم و ستەمدا ڕاست بینەوە ؟ ".

لە ڕۆژەکانی شەڕی دووەمی جیهانیدا برێشت لە قاودانی جنایەتەکانی فاشیزمی هیتلەری دەست پێدەکا و لە پارچە شیعرێ داتەلماتی نیشتمانی خۆی "١٩٣٣) بە خو یێی ڕۆڵەکانی خوێناوی دەبینێ و دەنووسێ " من باسی شەرم و شوورەیی خۆم دەکەم ، بەڵکوو هی دیکەش باسی شەرم و شوورەیی خۆیان بکەن ".

ساڵی ١٩٣٣ کە فاشیزم دەهات دەسەلات بگرێتە دەست ، برێشت بە ناچاری نیشتما نی خۆی بە جێ هێشت . لە پێشدا چوە پراگ و پاشان وێن و لە وێوە چوە سویس و فەرەنسە و دانمارك و سوید . ساڵی ١٩٤١ چوە بە کێتی سۆڤیێت و لە وێشەوە ١٩٤٨ چوە کالیفورنیا ئەمریکای شیمالی .

لە ساڵەکانی دەسەلاتی فاشیزم وشەری دووەمی جیهانیدا ، بە هەموو توانا و دەرە تانیەوە دژی فاشیزم خەباتی کرد . لە ساڵەکانی دەربەدەریدا ، باشترین بەرهەمە کانی هێنا سەر کاغەز و لە نومایشنامەکا نیدا جەوهەری دیکتاتوری وفاشیزم و ڕەگەز پەرستی نیشان دەدا .

برێشت لەسەر ئەو باوەڕە بوو : لە سەردەمێکدا کە هەر کەسە بۆ خۆی ڕێگایەك هەڵدەبژێرێ ، پێویستە هونەریش ڕێگای خو دیاری بکات ، یان بسپێتە داردەستی کەمایە تیەك کە چارەنووسی زۆربەی خەڵکی گرتۆ تە دەست و ئیرادەی خۆی بە سەریاندا دە سەپێنێ و دەیەوێ کوێر کوێرانە وەدوای کەون ، یان دەبێ لایەنی زۆربەی خەڵك بگرێ و لەگەڵ کۆمەلانی خەڵك بێ و بەرهەمەکا نی بۆ وریا کردنەوەو بردنە پێشێ هەستو وشیاری زەحمەتکێشان تەرخان بکات .

ئێمە بە بۆنەی یادی ٩٠ ساڵەی لە دایك بوونی ئەو هونەرمەندە مەزنەوە ، وتارەکە مان بە پارچە شیعرێکی ئەو لە بارەی فێر بوونەوە کۆتایی پێ دێنین .

" شتی هەرە ساکار و سادە فێر بە
بۆ ئەوانەی کە دەیانەوێ فێربن ،
قەت درەنگ نیە
فێری ئەلف و بێتکە بە ، ئەوە بەس نیە
بەلام فێری بە ، مەهێلە دل ساردت بکەن
دەست بەکار بە ، دەبێ تۆ گشت شتێ
بزانی
تۆ دەبێ ڕێبەرایەتی بگریە دەست
ئەی ئەو کەسەی ئاوارە و دەربەدەری
فێربە .
ئەی ئەو کەسەی لە بەندیخانەی
فێر بە
ئەی ئەو ژنەی لە ماڵێ دانیشتووی
فێربە
ئەی پیاوی شەست ساڵە فێر بە
تۆ دەبێ ڕێبەرایەتی بگریە دەست
ئەی ئەو کەسەی بێ ماڵ و حاڵی
وەدوای دەرس و قوتابخانە بکەوە
ئەی ئەو کەسەی لە سەرمان دەلەرزی
شتێك فێر بە
ئەی ئەو کلاسەی برسی ، دەست بدە کتێب
ئەوە خۆی چەکێکە
تۆ دەبێ ڕێبەرایەتی بگریە دەست
ئەی دۆست لە پرسین شەرم مە کە
مە هێلە بەزۆر شتت پێ بسەلمێنن
خۆت وەدوای کەوە
ئەوەی کەخۆت فێری نەبووی ، هەر وەزانە نایزانی
ڕیزی حیسابەکەت خۆت کۆ بکەوە
چونکە خۆت دەبێ بیدەی
قامکت لەسەر هەموو ژمارەیەك دابنێ
و بپرسە ، ئەمەیان بۆ چیە ؟
تۆ دەبێ ڕێبەرایەتی بگریتە دەست ★

# دەنگدانەوەی جینایەتی بەعسی لە هەڵەبجە

لە ئوتریش خوێندكارانی كورد، لە بەردەم باڵیوزخانەی عیراق، خۆپیشاندانیان رێك خست. بەكرێگیراوانی بەعس بۆ ترساندنی خۆپیشاندەران چەند گوللەیەكی تەقاند. پولیسی ئوتریش لە بەرامبەر ئەم كردەوە چەپەڵەدا خۆی مات كرد.

حیزبە ئۆپۆزیسیۆنەكانی بەریتانیا رژێمی عیراق تاوانبار دەكەن:

جورج روبرتسون ئەندامی پارلەمانی بەریتانیا و قسەكەری دەرەوەی پارتی كرێكارانی بەریتانیا بە توندی ئەو تاوانە چەپەڵەی حكومەتی عیراقی لە بەكارهێنانی چەكی كیمیاوی و لە نێو بردنی سەدان ژن و منداڵ مەحكوم كردوە. ناو براو داوای لە حكومەتی بەریتانیا كردوە كە لە رێگای كۆمەڵی نەتەوە یەكگرتوەكانەوە بكەوێتە كار بۆ راگرتنی ئەو جنایەتانە.

سیر راسل جونستون قسەكەری دەرەوەی پارتی سوسیالیست و ئازادەكان، بەیانێكی بڵاو كردوەتەوە و داوای كردوە كە سزای بازرگانی و قەدەغە كردنی چەك لە عیراق و ئێران بدرێ.

٢٦ ئەندامی پارلەمانی ئینگلستان لە بروسكەیەكدا بۆ سكرتێری گشتی كۆمەڵی نەتەوە یەكگرتوەكان بێزاری خۆیان لە بە كار هێنانی چەكی كیمیاوی بەرامبەر بە گەلی كورد لە هەڵەبجە لە لایەن رژێمی عیراقەوە دەربڕیوە و دە نووسن "مرۆڤایەتی ناتوانێ دەستەو ئەژنۆ بوەستێ بەرامبەر ئەو تاوانەی لە ئاست خەڵكی بێ تاوان دەكرێ".

هێندێ لە ئەندامانی پارلمان و كەسانی ناوداری بەریتانیا پرۆژەی بڕیارێكیان داوە بە پارلەمانی ئینگلستان، بە ژمارەی (٩٠٠) و لە ژێر سەردێری "عیراق چەكی كیمیاوی بە كار هێناوە" تێیدا گوتراوە "پارلەمانی بەریتانی رژێمی عیراق تاوانبار دەكا لە بەر بۆمبارانی دڕندانەی شاری هەڵەبجەی كوردستانی عیراق بە گازی سیانور و خەردەل و گازی ئەعسابكە بۆتە هۆی كوشتنی ٥هەزار كەسی مەدەنی و بریندار كردنی دەهەزار كەس، وەك رۆژنامەكانی گاردیان و دیلی تیلگراف و ئوبزێرڤەر رایان گەیاندوە."

لە سوید

پارتی سێنتەر لە بەیاننامەیەكدا بە كارهێنانی گازی دژی خەڵكی مەدەنی و ژن و منداڵ مەحكوم كردوە.

ئوكاپیترسون سكرتێری پارتی سێنتەر عیراقی تاوانبار كرد بۆ بە كار هێنانی گاز و چەكی كیمیاوی. هەروەها عیراق تاوانبار دەكا بە هەڵگیرساندنی شەر دژی ئێران. رۆژنامەی د پریسەی جیهان دەنووسێ: "عیراق گاز و چەكی كیمیاوی بە كار هێناوە دژی كوردەكانی هاو وڵاتی خۆی. پەیوەستە سەرنجی جیهان بۆ ئەو كارە رابكێشرێ."

رۆژی ٢٥/٣/١٩٨٨ خافیز پیریزدی كولار سكرتێری گشتی كۆمەڵی نەتەوە یەكگرتوەكان رژێمی بەغدای تاوانبار كرد بۆ بە كار هێنانی چەكی كیمیاوی و رایگەیاند كە هەموو بەڵگەكان ئەوە دەسەلمێنن كە عیراق ئەو تاوانەی كردوە.



لە سوید فیدراسیونی كۆمەڵە كوردستانیەكان بە هاوكاری هێزە سیاسیەكانی كورد لە سوید، خۆپیشاندانێكی گەورەی سازكرد كە نیزیكەی ٣هەزار كەس بەشداری كردبوو. هەروەها فیدراسیون نامەیەكی بۆ سەرۆك وەزیرانی سوید ناردوە وداوای لێ كردوە كە حكومەتی سوید بێزاری خۆی لە ئاست جینایەتی حكومەتی عیراق دەربڕێ و دەستی یارمەتی بۆ كوردە بریندارەكان درێژ بكا. فیدراسیون لەو بارەوە لەگەڵ رێكخراوی خاچی سوور و ئەمنێستی و دەزگای پارێزگاری منداڵانیش پێوەندی گرتوە.

لە بۆن پێتەختی ئەڵمانی رۆژئاوا، بە بۆنەی كوشتاری بە كۆمەڵی خەڵكی هەڵەبجە كوردەكان دەفتەری نوێنەرایەتی خاچی سووری نێو نەتەوەییان داگیركرد. داوای مەحكوم كردنی رژێمی عیراق وگەیاندنی دكتور ودەرمان و هەر چەشنە یارمەتی پێویستە خەڵكی لێقەوماوی هەڵەبجە.

لە شارەكانی دیكەی ئوروپا، لە بەرلین لە بەلژیك و لە دانمارك و هی تر هەر بەو بۆنەوە لە لایەن كوردەكانەوە خۆپیشاندان ساز كرا.

وەزارەتی دەرەوەی ئینگلستان لە لەندەن باڵیوزی عیراقی بانگ كردوە و بە رەسمی بێزاری خۆی لە بارەی كوشتاری خەڵكی هەڵەبجە و بە كار هێنانی گازی كیمیاوی راگەیاندوە.

پاشماوەی ل ٦

## هێزە سیاسیەكانی ...

بانگەوازێك

رۆژنامە و هەواڵدەرەكانی جیهان رایان گەیاند كە رژێمی فاشیستی عیراق "سەددام حسین"ی دیكتاتور جارێكی تر بە چەكی كیمیاوی شاری **هەڵەبجە و دەوروبەری** بۆمباران كردو بە گوێرەی دەنگوباسی گەیشتوو پتر لە ٥٠٠٠هاو وڵاتی لە ژن و منداڵ و پیر هاتوونە كوشتن. رژێمی بەعس جارێكی تر لە مێژووی خۆیدا ئەو رۆژە رەشەی تۆمار كرد كە لە هەموو یاسایەكی نێو نەتەوایەتی قەدەغە كراوە. وەك رانراوە ژمارەی شەهیدو بریندارانی ئەو كارەساتە گەیوەتە پازدە بیست هەزار كەس.

شەری ئێران و عیراق و گواستنەوە بۆ خاكی كوردستان لە لایەن هەردوو رژێمی كۆنە پەرست و دیكتاتۆرەوە كە بە سەر كەوتنی خۆیانی دەزانن بۆ لە ناو بردنی گەلی كوردە و بەس.

ئیمە داوا لە هەموو هاوڵاتیان و رای گشتی جیهان دەكەین كە دەنگی خۆیان لەگەڵ گەلەكەمان بۆ ریسوا كردنی رژێمی فاشیستی بەغدا بەرز كەنەوە.

بڕووخێ رژێمی فاشیستی بەغدا

سەرشۆڕی بۆ سەددامی فاشیست و خوێن ڕێژ

هەزار سڵاو لە ٦ ی ئازار رۆژی شەهیدانی كوردستان

بوەستێ شەری خوێناوی عیراق و ئێران

كۆمەڵەی خوێندكارانی كورد لە ئوروپا ـ لقی سوید

"سەركەزی بەراك" ٢٦/٣/١٩٨٨

**رۆژنامەی: مەردوم"** ئۆرگانی ناوندی حیزبی تودەی ئێران لەژێر سەر دێری **"فاجعەای مرگبار"** دا دەنووسێ:

"شەری وێرانكەری ئێران وعیراق جارێكی دیكەش كارەساتی مەرگباری پێك هێنا. رژێمی "بەغدا" بە چەكی كیمیاوی پێنج هەزار كەسی لە خەڵكی شاری كوردنشینی **هەڵەبجەی** كردە قوربانی كوشتاری دژی ئینسانی. كەڵك وەرگرتن لە مادەی كیمیاوی لە شەردا نەك هەر دژی یاساوری و شوێنی پەسندكراوی نێو نەتەوەییە، بەڵكوو هەروەها بە هەنگاوێكی دژی مرۆڤایەتیش دەژمێردرێ.

ئەوە هەوەڵین جار نیە كە خەڵكی زۆر لێكراوی كورد لە ئێران و عیراق دەكەوێتە بەر بە لاماری دڕندانەی رژێمە دیكتاتۆرەكانی دەسەڵاتدارەوە. رژێمی سەددام حوسێن لە عیراق بۆ كوشتاری خەڵكی كورد لە چەكی كیمیاوی كەڵك وەردەگرێ. لە ئێران خومەینی بە بۆمبای سووتێنەر و بە راكێت ئەم خەڵكە قەلاچۆ دەكا. دەرگا سەركوتكەرەكان لە هەر تك وڵات، هیچ ئاسایش و ئەمنیەتی گیانی و ماڵیان بۆ خەڵكی كورد نە هێشتوەتەوە.

ئەو كوشتارەی كە لەشكری عیراق لە هەڵەبجە كردی، دەری دەخات كە دیكتاتۆری عیراق هەر وەك هاوتای خۆی لە ئێران، بۆ سەقامگرتوویی رژێمەكەی دەست لە هیچ جنایەتێك ناگێڕێتەوە. درێژە پێدانی ئەو دوو رژێمە بۆ گەلانی ئێران وعیراق بێجگە لە هەژاری و رەنج و مەرگ هیچی دیكە نە بووە.

حیزبی تودەی ئێران كردەوەی دڕندانەی بۆمباران كردنی كیمیاوی خەڵكی بێدیفاعی شاری هەڵەبجە بە توندی مەحكوم دەكا. بۆ كۆتایی پێ هێنانی ئەو جنایە نەدەبێ شەری ئێران و عیراق كۆتایی پێ بدرێ. بڕیارنامەی ٥٩٨ی شورای ئەمنیەت، بۆ گەیشتن بەو ئامانجە بنە مایەكی لەبارە.

Jirupla 1

DU SALAN TEKOŞINA BERDEWAM




wan welatên ku Kurdistan dagirkirin. biçavekî rexnegirane helsengandine.

(Serdema Nû) bi alîkariya hevkar û xwîndkaran karîbû hewil bide, her tişt li ser Kurdistanê di rojnamên henderan de belav bûye, ew bi xwîndevanên Kurd re bide nasin û xwîndevanê Kurd li ser bîr û boçûnên dost û dijminên doza kur re haydar bike.

Kujiya (goşeya) "namên gehiştin" di (Serdema Nû) de ji du la ve girîngî hebû, ji alekî ve xweya kir ku xwîndevan rojnamê dixwînin û bi dilsozî rexnê lê digirin, rêya baş nîşa diden. Ji alek din ji ve em ji li boçûn û hizr û bîrên xwîndevan an gehdar bûn. Di wî warî de çend em karîbûn, me name belav kirine û bersiva wan daye, lê bersiva hinek naman me bi piştguh xistine, ji ber ku li gor bîra me ew li ser rêbaza (Serdema Nû) û berjewenda tevgera rizgarî xwaza Kurdî ne guncabûn.

Di dema wan du salan de (Serdema Nû) gelek rûdanên mêjoyî yên Kurdistanê û mêrên meydana xebatê û tekoşîna Kurdî zindî kirine. Bîna bîranîna Repoblîka demokretîka Kurdistan. 50 saliya berxwedana Dêrsimê, bûyerên meha adrê, xizîrana pirxwîn, çil saliya şehîd bûna pêşewa, bîranîna Şêx Mehmûdê Nemir, Goran, Hêmin, Nafî, Yonic, Gewî Mukriyanî, Tahir Tewfîq û Qenatî û ......

Bêgoman rêzgirtin li van bûyeran, rêzgirtine li xebata qehremanên niştimanî û jibîrnekirina wane.

Serdema Nû di sala xwe ya sêyan de, pişt stûr bi alîkariya dilsozên niştimanperwerên Kurd, ew Sozê dide di xizmeta kelpûta netewî û pakijiya ziman edêbî, ew li ser wê rêbazê berdewam be û bi rastî ew rûdanên Kurdistanê bêxte rû. Berjewenda xebata rizgarîxwaza netewa me bi parrêze. Ew kêmiyê di rûreşkirina dijminên Kurdistan de neke, û ji bona yekatiya hêzên demokretî û niştimanî yên Kurdistanê ji bo gehiştin bi armancên xwe û bi cî hatina xewna şorişgêrên Kurd û bêviyên şehîdên rêya azadiya Kurdistanê ew her têkoşan bike.

Di dawî de Serdema Nû supasiya wan hevniştimana dike yên ku alîkarî maddî jê re dane û nivîştok û gotar jêre şandine, û bi name û pêşniyar û rexnên xwe alîkarî kirine, û piştgirî kirine û pal pêve nana ku ev dirêjiyê bide rêbaza xwe ya demokratî û pêşketî û Kurdanî. ★

# 9 SAL PIŞTî RAPERîNA GELÊ IRANÊ

Di meha rêbendana ev sal de, neh sal biser raperîna gelê Irenê de bûrin. Rijêma Şahê diktator û ser bi emperyalîstê, di çarçûva sîstema sermayedarî ya pêşketî de, dezgehek polisî wiha danîbû, ku nikarîbû zêdetir di jîna nexweş û pir aloziyên civakî de berdewam be. Desthilat û cavedêriya pehlewî, beruvajî qanûnên esasî yên diktatorî û zext û li mengenedana sazmana emniyet, hemî rê û cihên azadî û demokratî li ben lingan dixistin, di gel aloziya barê aborî û civakî gehiştibû pileyek ku xelk bê giyan kiribû.

Ji alekî din ve, xebata nehênî ya çekdarî li dijî krêgirtiyên rijêmê, ji alê rekxirawên şoreşgêr ve, ta radeyekî xelk hişyar kiribûn û karîbûn nerazîbin û derkevin ser cehdan. Xelkê zehmetkêş û rût, burjuwazên biçûk û romakbîrên pêşketinxwaz, bi bilindkirina dirûşêm cora û cor, ku hemiyan roxandina rijêma dixwast, ew bihev re derketin meydanê li seranserî Iranê pirotest kirin.

Di destpêkê de Şahî dixwast, bi guhrina hinek caşên xwe agirê dilê xelkî vemirînit, ew ji bi anîna hinek nokerên emperyalîstê. Dema ew pilan serneketî û pitir berxwedana xelkî geş bû, wî dest kir bi girtin û kuştina xelkî, ku ew kuştina li meudana Tehran bûy, nimoneya vê bû. Her berxwadan germ û geş dibû, çîna karkerên Iranê û rekxirawên şoreşger dihatin rola xwe ya karîger bibînin û şorişe berev kûriya civakê biben.

Raştiya vê peywendiyê di wê de ye, ku Emrîka ditirsa şoreş bo alê çep bice û Iranê ji destên wê derkeve, ew ji bi serketina şoriş radikalî ya xelkî de.

Gerek em ji bîr nekin ku herdem Iran ji emperyalîstê re kelek mukume li dijî komonîzmê, Ew bû ku diblomasê emrîkî di rêya siyasî û nîzamî de kete kar. Di xwest ku yan rijêma şah bimîne, yan ji bi inqilabek eskerî ew desthilatê bêxin destê hinek efserên kirêgirtiyên xwe. Wezareta derveya Emrîkî dixwest ku li bin belga azadiya mafên mirovî şah here û rijêma borjuwa demokratî bi şêwa rojava bête ser kar û Iran ji xetera çep rizgar bike.

Ji bo vê çendê ji, wan Xumênî çav kiribû, ku bi (Gandiyê Iranê) nav kiribû.

Di vê peywendiyê de Şah wek bûkek bû di destê balyozxana emrîkî de, ku bê desthilat û bê irade mabû ew hemî xizmet û guhderî kirina emperyalîzmê û ew hemî çek leşker nikarîn wî xelas bikin. Taqma axûndegela Sie, bi serukatiya xumênî karîbûn di vê yaryê de ser kevin û hemî layên rast û çep bixapînin û serê berxwedana xelkî bi destê xwe bigirin û hukmeta mezhebî di şêweya serdemên naverast damezrînin.

Eger piştî 9 salan li berhemê berxwedana xelkî binêrin, di berhemê xwîna hezaran şehîdên rêya azadiyê û li karnama reşa hukmeta axûnde mêze keyh di deme neh salan de, ji bilî mal wêranî, şer, kuştin, giranî, bêkarî û birsîtî û çarereşiyê, tiştek din diyar nabe.

Di rojnamên opozisyonên Iranê de pir li ser kawdanên pir şepize yên Iranê nivîsîne, ku naxwaze em li vir dubare bikin.

Heya hêzên demokretîk wilo ji hev belav bin, û ew ji bo yeketî pêngavên rast ne havên, de her Iran di vî kawdanî de bimîne, û desthilata axûnde ji dest ji hukmetê na ber de.

Bi tenê nivîsîna li ser kaqezan çi derdekî tûmar nake. ★

Serdema Nû

BIXWÊNA,...
HARIKARÎ BIKE....
BLAV BIKE ....

Serdema Nû
TRYCK: ARARAT TRYCK
XWEDI:
Dr. Cemşid Hayderî
BERPIRSYAR& REDAKTOR:
Kerîm Hussamî
Postgiro: 420 4506 - 2
ISSN 0284-3412
P.O.BOX 7066
16407 KISTA
SWEDEN

